



Hejmara şexsî niha bêyî dawakirinê jî didin, eger îqameyê li Fînlandayê bidin te.

Eger îqameyê li Fînlandayê bidin te (îqame, penaberîti yan welatîyên qeydkirî yê Yekîtiya Ewropayê) 1.2.2019 yan piştî hingê, tu dê bi otomatîkî li ser sicla nifûsê ya Fînlandayê werî qeydkirin. Hevdem dê hejmareke şexsî ya fînlandî jî bidin te.

Şert ew e ku te şertên qeydkirinê hebin. Şertekî din jî ew e ku hikûmeta Fînlandayê nasnameya te qebûl kiribe.

Berê diviya ku dawaker bi xwe daxwaza qeydkirinê bike.

Mirov dikare tenê carekê hejmara şexsî wergire

Eger ji xwe te [hejmara şexsî](#) hebe, ew dê li ser îqameya te bê nivîsîn. Hejmara şexsî kevn nabe, û mirov dikare tenê carekê wê wergire.

Hejmara şexsî li ser karta îqameyê yan karta lêmanê ye

Tu dikarî hejmara xwe ya şexsî li ser karta îqameyê, karta lêmanê yan ji rûpela qeydkirina Navenda Qeydkirina Nifûsê bibînî. Wê rûpelê li gel biryarê didin mirovî.

Serdana daîreya nifûsê (maistraatti) bike

Wergirtina hejmara şexsî mirovî bi otomatîkî nake rûniştvan filan bajarî anku [rûniştvaniya bajarekî](#) nade mirovî. Bo wê yekê divê tu li daîreya nifûsê li bajarê xwe navê xwe qeyd bikî.